# Vaksena/derziya KOVÎD-19ê

## Vaksen çi ye?

Vaksen cureyek derman e. Ew ji derziyê derdikeve.

## Vaksen çi dike?

Lêdana vaksenê we ji nexweşiyê diparêze.
Bo nexweşyên cur bi cur vaksenên cur bi cur hene.

## Gelo vaksen ewle ne?

Erê. Bijîşk û zanyar gelekî kar dikin bizanin vaksen ewle ne. Tenê vaksenên ku wekî ewle erê bûne li Kanadayê bi kar tên. Ewlebûna vaksenan car bi car tê venêrîn.

## Gelo bo KOVÎD-19ê vaksen heye?

Erê, bo KOVÎD-19ê çend vaksen hene.

## Kîjan vaksîn derziya herî baş e?

Hemû vaksîn/derzî bo kêmkirina metirsiya pêketina KOVÎD-19 gelekî baş in. Eger piştî lêdana derziyê hûn tûşî KOVÎD-19 nebin, vaksîn metirsiya gelekî nexweş ketinê jî kêm dike. Bijîşk gel han didin yekemîn vaksîna ku dikarin wergirin li xwe bidin.

## Gelo vaksenên KOVÎD-19ê ewle ne? Ew gelekî zû hatin çêkirin.

Erê. Bijîşk û zanyaran gelekî kar kirin piştrast bin vaksenên KOVÎD-19ê ewle ne. Tenê vaksenên ku wekî ewle erê bûne li Kanadayê bi kar tên. Ewlebûna vaksenan car bi car tê venêrîn.

## Gelo dikarin ji vaksenê KOVÎD-19ê bigirim?

Na. Hûn nikarin ji vaksenê KOVÎD-19ê bigirin. Vaksen arîkar e bedena we KOVÎD-19ê nas û pê re şer bike.

## Gelo nîşaneyên kêlekê vaksena KOVÎD-19ê hene?

Piştî lêdana vaksenê, renge nîşaneyên wê yên kêlekê hebin. Renge piştî lêdana derziê milê we biêşe. Renge hûn xwe estî hîs bikin yan taya we hebe. Ev yanê bedena we bersivê dide vaksenê. Ev bandorên kêlekê dikarin çend rojan dirêj bibin.

Renge hin kes alerjiya wan bo vaksenê hebe. Renge nîşaneyên wan ên kêlekê cidîtir bin. Ev nîşaneyên kêlekê yên cîdîtir pirr kêm in.

## Eger nîşaneyên min ji çend rojan pirtir dirêj bin çi bikim?

Beriya vaksenê we vayrus girtiye. Eger nîşaneyên we ji rojekê yan çend rojan pirtir dirêj be, renge hûn nexweş ketibin. Hûn divê xwe cuda bikin *ji kesên din dûr bin) û testa KOVÎD-19ê bidin.

## Kingê dikarim vaksen bim?

Hûn dikarin niha wê wergirin. Li hemû parêzgehê imkana diyarkirina serdana lêdana derziyê heye. Hûn dikarin bo diyarkirina serdanê telefon bikin bo 1-844-626-8222 (1-844-MAN-VACC). Wergêrên devkî yên telefonî bi sedan ziman hene ku hûn dikarin bi kar bînin dema ku wext diyar bikin yan ser sûper malperan in. Hûn dikarin hûrgiliyan ser vir bibînin manitoba.ca/vaccine an protectmb.ca.

## Eger ez vaksenê lêdin gelo divê devpêçê lêdim û ji kesên din dûr bim?

Erê. Lêdana devpêçê û dûrbûna fîzîkî dê arîkar be hûn û kesên din ewle bimînin.

## Gelo divê diravê vaksenê bidim?

Vaksen bo hemûyan li Manitoba`yê belaş e.

## Gelo divê vaksenê lêdim?

Eger hûn dixwazin vaksena KOVÎD-19ê lêdin, dikarin hilbijêrin. Hûn neçar nînin vaksenê lêdin.

Gelek kes tiştên cur bi cur ser vaksenan dibêjin. Renge hin zanyarî rast nebin. Bo zanyariyên pirtir ser vaksenê dikarin bi pêkhînerên muqatebûna tenduristiyê re biaxivin. Ew dê zanyariyên baş bidin we.

**Herwiha dikarin serdana manitoba.ca/vaccine bo zanyariyên pirtir.**

Manitoba